Saldırı ve provakasyonları boşa çıkaralım!

Karkerên Hemû Welatan Yekbin!

# PÊŞENG

BO ŞOREŞ

29 KASIM 1985
ÖZEL EK

ORGANA KOMİTA MERKEZİ YA PARTİYA PÊŞENG A KARKERİ KURDISTAN

*Dı 2.11.1985'anda lı Stockholm'ê ji bo pirozkırına 10 saliya partiya me şevek hat çêkırın. Dı şevê de lı ser navê partiyê heval M.CIWAN axaftınek kır. Em vê axaftınê peşkeşi xwendevanan dıkın.*

## 10 SALİYA PPKK QONAXEK NÛ YE

Mêvanên Heja,

Hevalno,Hogirno,

Hûn hemû bı xêr hatın vê şeva pirozbahıya deh saliya partiya me. Dı vê şeva han de beri her tışti dıxwazım sıpasi parti, hêz û kesên heval û dost bıkım, ku dı pirozbahıvê de beşdar bûne an ji bı name û mesajen xwe pıştgırı, hevalti û dostaniya xwe bı me re nişan dane.

Her wıha bı munaseba axaftına vê şevê, dıxwazım lı ser navê partiyê slavên xwe bışinım jı wan heval û dostên ku fırset neditıne dı şevê de beşdarbıbın an pıştgıriya xwe diyarbıkın, lê bı dılê xwe, bı raman û tevgera xwe lı gel me ne, mıl dane mılê me. Disa pêwıstiyek gırıng lı ser mılê xwe dıbinım ku sılavên şoreşgeri rêkım jı wan partizan u dıkxwazên partiyê re ku lı welat dı bın nirê diktatoriya faşista kolonyalist a xwinrêj de, dı bın xetariya namlûyên sar û sıngûyên bı xwin de, şer dıkın, ala tekoşina serbıxweyi u azadiyê jı dest bernadın. Û car dın pewıste ku sılavên xwe rêkım jı wan qehremanên lawên gelê Kurd re ku dı zindanên dıjmın de, seri jı dıjmın re danaynın, bı dıl, raman û berxwedanên xwe ve, umid, baweri û şerefa gelê Kurd wek ala welat lı ezman dıhejinın. Sılav jı wan peşmergên qehremanên hemû perçên Kurdıstanê re, ku her çıqas dıjmın jı çarali de wek gurên har êrişê dıbın ser wan ji, tekoşina rızgarixwazi û ala azadiyê roj bı roj bılındtır dıkın, xwina xwe jı xelasiya welat re dıkın bedêl û agırê ruhe serxwebûn û azadiyê, lı ser çiyayên serbılınd ên Kurdıstanê vêxısti dıhêlın. Û a gırıngtırin wezife lı ser xwe dıbinın ku, dı vê şeva han de, şehidên şoreşa Kurdıstanê û en şoreşên hemû gelan dıbir binım, ku jı bo damezırandına dınyak gerdenaza bê xwinmeji û kedxwıri şer kırın, bı destên emperyalistan, mêtingehkaran, xwinrıjên faşist an kedxwıren kevneperest hatın şehidkırın; berê xwe bıdım karwanê şehidan û bankım, bêjım "Şehidno! hezar hezar sılav lı we û a rasti hezar hezar xwezi bı we ku jı dêvla bındesti û serixwarkırınê we vê rîya piroz lı ber me vekır!"

Geli mêvanên hêja,

Hevalno,

Partiya me; Partiya Pêşeng a Karkeri Kurdıstan, isal deh saliya jiyana tekoşeriya xwe dıdomine. Dı Nisana 1975'a de hat damezırandın. Deh sal ne demeki dûr û dırêje. Lı gor diroka şerê rızgarixwazi ya gel û çinên bındest, deh salên tekoşinê, wek dı salê de rojek be. Jı xwe dirok bı deh salan tê pivan.

Deh sal dı diroka rızgarixwazi û azadi ya gelê Kurdıstan de ji ne qonaxek dûr û dırêj e. Gelê me, bı sed salan e lı hember zılm û zora dıjmınê kevneperesti kedxwur û xwinrêj, bê rawestan û bê westan şer dıke, xwina xwe dırêje.

Lê gava em rawestın û bala xwe bıdın van deh salên lı pey me mayi, emê bıbinın ku erê demeki kurt e lê bı bûyeren tê de

pêkhati ve, dı rûpelên diroka Kurdıstanê de bı layıqi ciyê xwe gırtiye, xwe kıriye merhelak nuh dı qanaxa diroka têkoşeri de.

Helbet geli heval û mêvanan, têkoşina mıletê Kurd deh sal berê dest pê nekır. Rehên dara serxwebûn û azadiya gelê Kurdıstanê jı kûrayiya sedsalan xwe dıgrın û tên. Bı sedsalane ku mıletê Kurd lı dıji dıjmınên dagirker şer dıke û seri hıldıde. Pışti her êrişek hov û har gava serihıldan têkçûne, dıjmın hesab kıriye ku pışta tevgera rızgarixwaziya Kurd êdi şıkiya ye û mesela Kurdi nemaye. Lê demek dırêj tê re neçuye, mıletê Kurd disa seri hıldaye, disa doza mafên xwe yên milli û demokratik, doza azadiya xwe kırıye.

Loma ji Partiya me avabûna xwe û vê tekoşina xwe ya deh salan, wek dewama tevgera rızgarixwazi ya mıletê Kurd a sedsalan dızane. Lê her çı dewama vê tevgerêye ji, em avabûna partiya xwe, hesab dıkın ku dı Kurdıstana Tırkiyê de merhelek bılındtır û nûtır e. Lewra erê vê qonaxa ku em iro têde ne, ew ji qonaxa şerê rızgarixwazi û bı dest xıstına mafên milli û demokratik e, lê bı armanc û hedefên xwe ve, bı naveroka tekoşina xwe ve û bı rê û dırbên awaye tevgera xwe ve, jı tevgera pêşin tê cûdakırın. Tevgerên milli yê gelê me yên berê, weki hûn ji dızanın pırani dı bın serokatiya beg û axên Kurdıstanê, serekeşiran, reisên dini û ronakbirên nıştımani yên çinên serdest de bûn. Erê wan ji doza mafên milli, doza welateki serbıxwe dıkır ., lê jı ali dın ve guh nedıdan daxwaz û mafengelê Kurd. Dı bir û baweri û programên xwe de, behsa bıdestxıstına mafên karkır û gundiyên Kurdıstanê, zenaatkar û zehmetkêşên welat yên ditır nedıkırın. Û a gıringtırin ji ew bû ku pıraniya nufûsa welat jı wan zehmetkêşan jı krêkar û gundiyên Kurdıstanê pêk dıhat. Serekên serihıldanan gava seri hıldıdan, bes bı tesira bawerıyen mıli u bı tesira peywendıyen eşiri, derebegi u dini wan lı pey xwe dıkêşendın. Zehmetkêşên welat daxwaz û berjewendiyen xwe yên esasi, mafen azadıyê ye heqiqi dı van tevgeran de nedıditın. Pırê caran jı bo beg û serokeşirên xwe an şêxên xwe dıketın serihıldanan, gava serokeşir , beg an şêxên wan, baş de vedıkışiyan, seri xwardıkırın an ji teslim dıbûn, ew ji lı pey wan dıçûn. Gelek caran, jı ber berjewendiyên çinayeti ji çinên serdest ên welat, pêşiya xwe dûr û dırêj nedıditın. Dı serihıldanan de, nıkaribûn yekitiya pıraniya mılet pêkbinın, bê istikrar bûn, baweriya wan zû dışkiya. Loma ji dıjmın, bı erişên dıjwari, bı dek û dolaban karibûn hêsatır van serihıldanan bıroxinın.

Dı rehberiya Marksizm--Leninizmê de lı ser bir û baweri û programek bı sosyalizma zanısti bıngehkıri, avabûna partiya çina karkerên Kurdıstan, dı qonaxa tevgera rızgarixwaza milli ya demokratik de dı Kurdistana Tırkiyê de merhelek nûh vekır. Cara pêşin bû ku programê daxwaza milli lı ser esasê çinayeti, lı gor mafên kırêkar, gundi û zehmetkêşên ditır ên welat; lı gor mefên pıraniya nufûsa welat hat damezrandın.

Bı saya ronahiditına vê bir û baweriya zanısti ye ku êdi, kırêkar û gundiyên welat ne jı bo axa, beg û serekeşirên xwe, ne bes jı bo avakırına devletek milli, lê jı bo bıdest xıstına mafên xwe yên çinayeti û azadiyan dı Kurdıstanek serbıxwe, demokratik û azad de berê xwe dıdın şerê rızgariya welat. Gundiye Kurdistanê dıbine ku bı rızgarbuna welat ewe ji bıbe xwedan zevi, wê jı bın nirê axatiyê û peywendiyên eşireti yên kevnare xelas bıbe. Bı tıfaqa kırêkar, gundi, zenaatkar, ronakbir û zehmetkêşên ditırên welat; bı tıfaqa hemû hêzên welat, çı jın û çı mêr hemû bındest û zehmetkêşên welat dı Kurdıstanek serbıxwe de wê bıbın efendiyên xwe, xwediyê welatê xwe, azad, jı kedxwıri û xwinrêjiyê dûr, dı nav adıli û aşitiyê de bıjin.

Geli heval û mêvanan,

A sedem eve ku em dıbêjın ku qonaxa jı deh sal berê de destpêkırı, dı diroka Kurdıstanê de merhelek bılıntır û nuhtır e.

Dı van deh salên merhela nuh de bir û baweriyên sosyalizma zanısti, xwe da ispatkırın ku, dı helkırına problemên cıvaka Kurdıstan de, dı helkırına mesela milli lı gor mafên pıraniya mılet de bıkêrhatitırin bir û baweriye. Û heta bes ew dıkare doz, daxwaz û problemên mıletê me dı esasi de helbıke, gelê me bıghine armanca wi ya dawin, bıghine jina rojen bê kedxwırı, bê ser-

www.arsivakurdi.org

desti û bındesti, jina rojen azadi, wekhevi û aşiti.

Loma ji dı van deh salên çûyi de, partiya me dı nav karker û gundiyên Kurdıstanê de, dı nav xort û xwendevanên welat de şax veda, roj bı roj xelkê berê xwe pırtır dan tekoşina şoreşa mılliya demokratik a geleri ya Kurdıstanê. Tevgera şoreşgeri ya jı bo bı destxıstına mafên mılli û demokratik, dı nav gel de reh berda, karektereki geleri wergırt, lı her quncıkê welat şax da û bû malê gel. Ev bir û baweri û tevger, dı nav gel de bı wi awayi hat meyandın, ku êdi dıjmınê gelê me, ne bı êrişên xwe yên hov û har, ne ji bı dek û dolab û fêlbaziyan nıkare bışkine, bıtemırine û jı nava gel rake. Êdi, tevgerek şoreşgeriya bê rawestan û bê nabên ava buye. Erê, rıya tekoşinê lı ser xetek rast û fıreh nameşe. Carna rasti fetlok û kaşan tê, carnan sıst dıbe paş de dımine, lê ev yek qedera rıya me tayın nakın. Wek tavana bıharê tên û dıçın. Ê ku cıyê xwe bı himi gırtiye, rıya rızgarıyê, rıya roja zaferê ye. Êdi me baş baweri pê aniye ku tu tavan u teyrokên bıharê wê nıkarıbın rıya rojên roni, germ û xweş bıgrın.

Nımûna vê baweriyê, ev pênc salên dawi yên bın nire diktatorıya faşist a xwin rêj e. Em hemû ji baş zanın ku sedemê hatına cûnta faşist a Tırk, yek jê ji xurt bûn, gur û geşbûna tevgera rızgariya gelê Kurd bû. Beri 12'e İlona 1980'i roj bı roj tevgera şoreşgera Kurdıstana Tırkiyê xurttır dıbû. Her ku dıçû, hêviya(umida) xelkê jı partiyên bırjuwaziyê Tırkıyê dışıkıya u berê xwe dıda tevgera têkoşeriya rızgarixwazi. Hest û baweriyên mılli dı nav gel de fıreh dıbû. Vê yekê, tırs dı dılê metıngehkarên Tırk û emperyalistên hevalbendên wan fırand û xewa wan revand. Loma ji gihaşt qonaxek wılo ku, jı bıli darbek eskeri ya faşist tu rıyên ditır lı ber xwe nedin.

Gava darba faşist bı serket ji, yên ku mezıntırin, tûj û tundtırin êriş çûn ser wan, yek jê ji gele Kurd bû. Herçıqas beri darbê ji, sıtemkari, kedxwıri û zordestıya lı Kurdistane dıhat meşandın, jı ya derên ditırên dewleta Tırkıye pırtır bû ji, bı hatına hukmê diktatoriya faşist, lı Kurdıstanê êriş, tadayi zılm û zorên nediti sazbûn. Yek bı yek bajar û gundên Kurdistanê ketın bın postalên ordiya Tırk, namlûyên sar û sıngûyên dırêj lı her derê welatê me xwina Kurdan rıjand. Bı deh hezaran şoreşger, welatparêz û têkoşerên lawên gelê Kurd gırtın avêtın bınê zindanan. Bı sedan şoreşger dı işkencexanan de dı qereqolên polis û cendırman de hatın şehid kırın.

Diktatoriya faşist a Tırk êrışên xwe yên esasi, bır ser parti û rêxıstınên sosyalist, welatparêz û şoreşger ên Kurdıstan. Armanca wan ew bû ku, parti û rêxıstınan jı nav gel rakın, pışta tevgera şoreşgeriya nıştımani bışkinın, gel bê hêvi bıhêlın û bıkın ku baweriya mılet bı roja xelasiye bı zafera azadiyê nemine, pergala mêtıngehkarıya kedxwır, cıye xwe dı welat de tekûztır û ımre xwe dırêjtır bıke.

Erê raste ku dı van pênc salên bın nirê diktatoriya xwinrêj de, parti, rêxıstın û kesên sosyalist, şoreşger û welatparêzên welat, dı bın êrişa dıjmınê ku pala xwe daye nizama sermıyandariya emperyalist de, gelek êşiyan, gelek xwin wındakırın û tevgera rızgarixwaziya nıştımani gelek bı paş de ket, lê diktatoriya faşist çı kır nekır, nıkaribû xebata şoreşgeri ya parti û hêzên gelê Kurdıstan jı holê rake, hest û baweriyên nıştımanperweri dı nav gel de pûç bıke. Dara serxwebûn u azadiyê a ku bı xwin u xwêydana şoreşgerên welat hatiye avdan, cıye xwe gırtiye, rehên xwe bera kûrayiya axa welat daye. Dıjmın çı bıke ji, pır pır karıbe guliyên dare bıqurıfine. Ew dar ne hışk dıbe û nema jı rehan kare bê rakırın. Ew temamê guliyan jêkın wê şaxên nûh zildayi, hê gur û geştır jı kokê de rabın. Encama van pênc salên zordesti û xwinrêjiyê ji vê rastiyê radıxe ber çavan.

İro, pışti pênc salan, diktatoriya faşist bı xwe ji mecbur bûye, itiraf dıke ku koka têkoşerên welat nehatiye, parti û hêzên dıxwazın "welat perçe bıkın" cardın dest bı kar kırıne. Lı hundır û lı dervayi welat jı bo armancên rızgarixwazi xebat dıkın.

Geli heval û mêvanên hêja,

Van pênc salên han ne ku tenê dan xuyakırın ku tevgera şoreşgeri natemıre. Her wısa gelek baş eşkere bû ku, diktatorıya faşit nıkare tu daxwazên mılet bı cih ji bine. Dı bın nirê diktatoriya van pênc salan de, rewşa cıvakê her ku çû xerabtır bû. Bêkari

www.arsivakurd.org

bırçibûni, bıhayi û feqiri zêdetır bû. Siyaseta abori ya diktatoriyê, ked û xwina gel bı awaki bê perwayi dımije, dıbe dıxe kisê çend monopolên bırjûvaziyê gıregırên welat û dıxe kisê monopolên navnetewi yên emperyalist.

Çı Kurd û çı Tırk yan ji mıliyetên dıtır, jı rejım nerazine. Îro ew çêtır dıbinın ku ev rejıma faşist u serdest tu fêdê nagehine wan, roj bı roj rewşa wan, halê wan xırabtır dıke û lı ali dın ji pışta xwe daye çend dewlemendên gıregırên Tırkıyê jı bo menfaetên wan lı ser kar dımine, jı bo menfaetên wan vê siyaseta abori dımeşine û jı bo menfaeta wan vê zılm û zorê lı sazxıstıye.

Geli heval û mêvanan,

Çı lı hundırê welat û çı ji lı derva, iro rejima faşist a Tırkıyê ketıye tengasiyê. Kriza aboriya Tırkıyê derbas nabe. Jı bo derbaskırına kriza abori, hewqas zem, feqiri zılm û zordesti anin ji lê disa iktisada welat sererast nebû. Îro ne ku bes zehmetkêşên gelên Tırkıyê û Kurdıstanê, her wıha ısmek jı bırjuvazıyê Tırk bı xwe ji nerazibûna xwe lı dıji rejım, lı dıji vê siyaseta abori nişan dıde. Ne ku muxalefeta gelan tenê lı hember rejım kûrtır û fırehtır buye, her wıha, alozi dıjayeti û nerazibûn ketıye nava bırjuvazıyê Tırk bı xwe ji . Lı aliki mıxalefeta gelan, lı ali dın dıjayetıya nav bırjuvazi bıxwe, istikrara rejım xera dıke, dıjwarıyên nuh derdıxe hemberi rejım. Her ku dıçe pırtır cih lı rejımê faşist teng dıbe.

Dı warê navnetewi de ji rejıma faşist a Tırkıyê, pêberi gelek gir û gruftên dıjwar buye. Tırkıye her ku dıçe, dı warê abori, siyasi û leşkeri de pırtır bı emperyalizmê û bı taybeti ji bı emperyalizma Emeriki ve tê gırêdan. Roj bı roj pırtır rola cendırmetıya emperyalizma Emerika û NATO ya êrişkar hıldıde ser mılê xwe, bı tehditkari berê xwe dıde welatên sosyalist en cinar wek Yekitıya Sovyet û Bulgaristanê. Dı çarçeva planên NATO û hêzên şerxwazên kevneperestırinê emperyalizmê ku serakatıya wan Emerika Reagen dıkışine, a dı çarçeva planên wan de Tırkıye lı herêma Rojhılata Navin, siyasetek êrışkar dımeşine; anti-komunizm, anti-Sovyetizm, şovenizm û nijadperestıyek êrışkar buye himê siyaseta wê. Lı hember Bulgaristan, Yewnanistan, Qıbrıs û gelên Ereb û cinar şovenizmê radıpelıkine. Bı êrişên ser Kurdıstana Tırkıyê têr naxwe, destê xwe dırêji perçên welatê me yên dınê ji dıke. Vê siyaseta han, dı ware navnetewi de ji nerazibûn û dıjayetıyekê lı hember Tırkıyê tine holê.

Geli hevalan,

Geli mêvanên heja,

Erê iro, diktatorıya faşist a Tırkıyê dı hundır û qada navnetewi de ketıye tengasıyê, istikrar dı siyaset û aboriya rejım de tuneye, nakokıyên nav rejım kûr dıbın, lê bawerıya partıya me ne ew e ku van nakoki, bê istikrari û tengasıyan bı serê xwe karıbın vê rejıma xwinmêj bıroxinın. Na, Lı tu dere dınê nehatıye ditın û lı Tırkıyê ji wê neyê ditın , ku rejım jı ber xwe ve bıkeve , an bı kêfa xwe bêje ez seri te re dernaxım û ezê bıçım. Çıqas bê istikrari, dıjayeti û tengasi hebın ji, heta dı nava mılet de hêzên mıxalıfên rejım, bı qeweta xwe ya têkoşeri rejım nexinın, van sedeman jı bo roxandına rejım ne bes ın. Ê ku rejıma faşist a diktatori bıxine têkoşina yekbûyi ya hêzên dıji faşizmê ên Tırkıyê û Kurdıstana Tırkıyê ne. Heta gelê Tırkıyê û Kurdıstanê, hemû hêzên dıji rejım ên her du welatan xwe nekın yek û êriş nebın ser diktatoriyê ew rejım hılnaweşe. Wi nirê zordestıyê jı ser gelê me ranabe.

Em hemû ji baş pê dızanın ku yek jı sedemên têkneçûna rejıma faşist a esasi ji ewe ku têkoşina her du gelan nebuye yek û bı berfırehi û aktifi lı hemberi rejım ranebuye. Perçebûn û xebata cuda cuda ya hêzên dıji faşizmê, hım lı Kurdıstanê, hım ji lı Tırkıyê berdewame. Rejım ji ji vê perçebûnê fêde dıgre û ımrê hukmê xwe yê diktatori dıdomine.

Geli heval û mêvanan,

Partıya me, wezifa roxandına rejıma faşist, wezifeke acil dıhesıbine, dıvê beri her tışti çı Tırk çı Kurd û çı ji mılıyetên dın em hemû, hêzên xwe bıkın yek û êriş bıbın da ku rejima faşist hılweşinın. Hılweşandına rejım hım wê rıya rızgarıya Kurdıstanê veke û hım ji rıya şoreşa gelerıya gelê Tırk veke.

Jı bo yekgırtına hemû hêzên dıji faşizmê ji, beri her tışti dıvê perçebûn û belabûn jı

nav hêzên çep û şoreşgêrên Kurdıstanê u Tırkıyê rabe. Ger parti, rêxıstın û hêzên çep û şoreşgêrên Tırkıyê û Kurdıstana Tırkıyê tıfaqek demokratik a şoreşgeri dı nav xwe de çêkın û alternatifeki şoreşgeri ku wê xelasıya rasti nişani gelên me bıde, derxının meydanê, wê gavê hêsatır û teküztır we yekitıya hemû hêzen dıji faşizme pêk bê. Ev wazife hem lı ser mılê sosyalist û şoreşgêrên Tırk hem ji lı ser mılên e Kurd e.

İro xeterek lı pêşıya her du gelan heye. Lı aliki jı diktatorıya faşist bıgre heta bıghê sosyal demokratên Tırk, çı lı hundıre welat û çı ji lı dervayi welat kar dıkın, dek û dolaban dıgerının da ku mesela rızgarixwazi û mafên milli û demokratik ên gelê Kurd dernekeve meydanê. Heta dıxwazın tesirê lı komınist û çepên şoreşger ên Tırk bıkın ku dev jı daxwaza dayına mafên mılli yên Kurda berdın, alikari û pıştgırıya xwe jı doza Kurdi vekışının. Bı vê siyaseta fêlbazi û şovenist dı xwazın yekgırtına têkoşina her du gelan xera bıkın wan perçe bıkın û bı vi awayi nirê zordestıye hêsater lı ser wan bımeşının. Partıya me bı her awayi hewl dıde da ku bıkarıbe bala hemû hêzên çep ên Tırk û Kurd bıkşine ser vê sıyaseta kırêt û planên perçekırına têkoşina gelan pûç bıke.

Jı ali dın dı nav tevgera Kurdi de ji hın kes û hêz hene ku rexne lı tıfaqên me bı sosyalist û çepên Tırk re dıgrın, nerazibûna xwe jı vê tıfaqê re nişan dıdın. Heta hın kes bı tundi dıjmınatıya vê yekê dıkın. Lı gor bawerıya me ev baweri ji çewt ın û zırarê dıdın tıfaqa her du gelan. Û bê şık zırarê dıdın têkoşina gelê Kurd bı xwe ji. Em baş zanın ku ne gelê Tırk, ne Erep û ne ji Farıs dıjmınê gele Kurd ın. Dıjmınê me hemuyan hêzên bırjuvazi û kevneperestên serdest ê welat û hevalbendên wan i emperyalist ın. Dıjmınê me û wan mışterek ın. Ger em tıfaqa gelê xwe û wan bıkın yek beri her tışti rêya têkoşina gelê me hêsatır û zafera gelê me nêziktır dıbe. Em dıjmınê xwe çı qas tenê bıhêlın û dost û mıtefikên xwe pırtır bıkın rıya xelasıyê hew qas pırtır jı bo me kıntır dıbe.

Bawerıya partıya me , dı tıfak û yekgırtına têkoşina gelê Kurd û Tırk de ji jı dema avabûnê û heta iro eve û jı nıha pê ve ji wê ev be. Emê lı ser ve bawerıye mımeşın û ji bo tıfaqa têkoşina herdu gelan çı wazife tekeve ser mılên me emê pekbinın. Devê riyê de lı dıji bir û bawerıyên çewt ( Çı jı hêzên çep ên Tırk çı ji yên Kurd bê) emê rawestın.

Mêvanên hêja ,

Hevalno,

Dı roja iroyin de wazifek gıringi ditır ji lı ber hêzên nıştımanperwer û şereşgêrên Kurdıstana Tırkıyê heye ku ew ji pêkanina hevkarıya hemû hêzên nıştımani, û avakırına cephek mılli a demokratik a gelêrıye. Partıya me wek partıya çina karkerên Kurdıstan, tıfeqekê dı nabêna hemû hêzên şoreşgêr û nıştımani jı bo bı serketına şoreşa mılli a demokratik a gelêri pêwist dıbine. Qonaxa me qonaxa şoreşa rızgarixwazi û azadıyêye. Dı vê qonaxê de tu parti an hêzek lı serê xwe nıkare seri bı ve wazife re derxe. Jı bo avakırena Kurdistanek serbıxwe, demokratik û azad dıvê hemû parti, rêxıstın û hêzên şoreşger, nıştımanperwerên welat hêzên xwe yek bıgrin û dı çarçewa cephek nıştımaniyi demokratik bıghên hev.

İro em jı tıfaq û yekgırtınek wıha bêpar ın. Têkoşina me çı lı hundırê welat û çı ji lı derva bela wela ye. Pıştı bıserketına diktatorıya faşist û pêşdeçûna dewra kevneperesti, perçebûn dı nav hêzan de pırtır bû. Hema hema bıgre hemû partıyên Kurdıstanê carek du car lı zınar u newalan qewımin, perçebûn dı nav wan de çê bû. Vê yekê gır û guruftên ber pêkanina yekgırtına hêzên nıştıman perwarên Kurdıstan dıjwartır kır. Heta iro çend caran dı rıya hevkari u yekgırtınê de her çı qas hın gav hatın avêtın ji jı ber problem û êşên kevn û nuh, heta iro rê lı ber yekiti an tıfaqekê venebû.

Her çı qas iro em ji baş dıbinın ku gelek problem lı ber rıya tıfaqa hêzên welatparêz ên Kurdıstanê hene ji lê em dı wê bawerıyê de ne ku hemû parti, hêz û rêxıstın heryek jı ali xwe de bı cıdıyet berê xwe bıde mesela tıfaqê û xwe amadeyi hınek fedekarıyan bıke mımkun e ku dı demek nêz de yekgırtınek dı nabêna hêzên welat de pêk bê. Helbet jı bo tıfaqek wılo em nıkarın jı hêzan bıxwazın ku dev jı prensibên xwe yên esasi berdın. Heta ne lazıme ku dev jı prensibên xwe yên esasi berdın ji. Lê,

dıvê baş bê zanin ku bêyi fedakari û beyi lıhevhatınek maqûl tu tıfaq ji çênabın.

Lı ser van esasan, partıya me iro ji amadeye ku, hevkari an tıfaqek dı nabêna hemû hêzên şoreşger û nıştımani yên Kurdıstana Tırkıyê de, pêk bê. Weki berê ji me got; iro yek jı dıjwarıyên pêkanina hevkariyê ji perçebûyına van salên dawi ye.İro gelek hêz, rêxıstın an grubên nuh derketıne. Lê ev veqetandın an perçebûn dı wareki tabii de pêk nehatıye û nemesiyaye. Hınek hêz an grûb bı navê partıyên ku jê veqetıyane derketıne. Lı ser navê wan partıyan kardıkın. Helbet vê çewtitıyê nexweşi û dıjayetıyên nuh bı xwere anine.

Bir û bawerıya partıya me ewe, ku parti dıbê van perçebûnan; derketına hêzên nuh berbıçav binın, ne ku çavên xwe lı wan bıgrın. İro dı mesala tıfaq û hevkariyê de helbet dıvê lı ser van hêz û grûbên nuh ji bê rawestan. Le lı ali dın bawerıya partıya me ewe, ku dı pêkanina hevkari û tıfaqê de gelek wazife dıkeve ser mılên van grûb, hêz an partıyên nuh ku jı hêzên ditır perçebûne, veqetyane. Dıvê ew ji rojekê zûtır problemên xwe bı partıyên ku jı wan veqetıyane, bı wan re helbıkın û wek hezni serbıxwe, wek partıyên nuh, rêxıstınên nuh cıyê xwe dı têkoşina welat de bıgrın daku rojekê zûtır tıfaq, hevkari yan cebheyek dı nav hêz u partıyên welat ên niştımani de pêk bê. Prensibên partıya me ewe; em; hêzên ku nuh derketıne, ger lı ser navê partıyên berê jı wan veqetıyane, lı ser navê wan xeber nedın û idia nekın ku wan temsil dıkın; lı gor bir û bawerıya me bı çı awayi veqetıyane bıra veqetın hêzên wan,qewetên wan çı dıbın bıra bıbın, dıvê ev hez û parti û rêxıstınên ditır bıgıhijın hev tıfaqekê dı nav hev de pêk binın. Wazifa ku lı ser vê yekê bıkeve ser mılê me, emê bı cih binın û em dıxwazın hemû parti, rêxıstın û grubên welat ên şoreşger û niştımanperwer ên dınji vê wazıfa han bı cih binın. Ger em yekiti bıkın, bıghijın tıfaqê, dıjmın nıkare bı me, rıya xelasi û rızgarıyê wê kıntır be, roja zaferê wê zûtır be.

Bıji Yekitiya Hêzên Niştımanperwer ên Kurdıstan!

Bıji Yekitıya Hêzên Dıji Faşizmê Ên Kurdıstana Tırkıyê û Tırkıyê !

Bımre Diktatorıya Faşist!

Bıji PPKK

Bıji Enternasyonalizma Proletarya!

● ● ●

www.arsivakurdi.org